

Şeva nemerdîyê .. Êşa ku nayê ji bîr kirin



PEYVA WELAT

Kovara WELAT
Çandî- Giştî- MehaneSernivîser:
Aras YûsivDesteya rêvebir:
Imran YûsivDizayner:
Hesen BerzencîTêbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerfna
xwediyê xwe ne û nivîskar berpîrê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:

welatpress2014@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Şeva nemerdîyê .. Êşa ku
nayê ji bîr kirin

Desteya sernivîs

Ev 100 sal in ku feleka bêbext nervîna kurdan bi tevneke xwînê dirêse, komkujîyek li dû komkujîyekê em pakrewanên xwe dihejmêrin û di bîranînên wan de mûm û findan dadidin.

Wek ku bobelatek di ser bobelatekê re heye, mirinek di ser mirinekê re heye û êşek di ser êşekê re heye, her wiha komkujîyek jî di ser komkujîyekê re heye.

Komkujîya şeva nemerdîyê ne wekî ti komkujîyê bûye, di vê komkujîyê de kujeran sînore hovîtiyê derbaskirin, wekî kerîyekî guran di şaeveke tarî de êrîş kirin, armanca wan kuştin bû...tenê kuştin bû. Wê şevê kobanî di hembêza bajarê xwe yî birîndar de razayî bûn, û Kobanîya ku nû hatibû rizgarkirin hîn birînen xwe derman nekirbûn, hîn bîna merinê ji kolanên wê dihat, û xwîna pakrewanan li ser dîwarên wê zuha nebibû, nalenala dayikan tevî lîrandinên rizgariyê dibû.

Di wê şevê de kobanîyên ku nû vegeriyabûn bajarê xwe yî wêranbûyî di xeweke şêrîn de bûn, ev cara yekemîn bû ku hest bi aramîyê dikan.

Çi dijwar e ku mirov di xew de bê kuştin bêyî ku bizanibe çima û ji bo çî tê kuştin, bêyî ku rûyê kujerê xwe bibîne, bêyî ku derfeta desthilanînê bi dest bikeve û karibe li ber xwe bide.

Di wê şevê de kujerên nemerd giyan dane ber çinîne bêyî ku cudahiyê bikin di navbera jin û zarokan de, pîr û kalan de, sivîl û şervanan de, a pêwîst li ba

wan ew bû ku ew giyan giyanekî kurdî be. Ev komkujîya ku di şeva 25-6-2015an de li bajarê Kobanê rûda, di dîroka gelê kurd de bobelateke pîr mezin e, û asta nemerdîya dijminê gelê kurd nîşan dide.


Îro roj dema ku em pakrewanên vê komkujîya hovane bi bîr tînin dilên me yên şkestî di bin barê xemgîniyê de dinalin, divê em ji bîr nekin ku pêdiviya me bi hêşiyariyê heye da ku komkujîyên bi vî rengî dubare nebin.

Dema ku em gavên xwe ber bi azadiyê ve tavêjin divê haya me ji nemerdîya dijmin hebe, û divê awa û tedbîrên xweparastinê di asta herî bilind de bin.

Ji bo giyanên pakrewanên şeva nemerdîyê em aramî û sermedîyê dixwazi ■ ji bo kujerên wan nifretê û rûreşîyê.

تَبْنِي ثَوْرَةَ
adopt a revolution

JI FOLKLORÊ KURDÎ.. DÛRIKEK GOVENDÊ "ŞÊLÎ ŞARÊ ŞARA MIN"



Berevkirin û lêkolîna

Salihê Heydo

Folklor : tarîxa millet ya ku derbasî nivîsandinê nebûye. Berevkirin, şirovekirin û belgekirina wî ji erkên netewî, welatparêzî û milletperwerî ye.

Bêguman berpirsyarên sereke diber dadgeha millet de rewşenbîr, nivîskar û ragihandin e heger ku wî ji windabûnê biparêzin.

Xwendevanên hêja û delal; ev dûrika ku min li jêr nivîsiye ji gencîne û xizna herî dewlemend û tere, ji folklore û zargotina kurdî ye, beşa balkêşî kurmancî ku li gor ger û lêkolîna min li ser û xwendina firdik û xêzên wê vedigere welatê Amedê (Diyarbekrê) di gêra Hezro û Farqînê û deşta Bişêriyê, çimkî navê keçika ku xort dûrik avêtiye ser û bûye mirîd û peyrewê evîna wê Şarê ye, ji hoz û êla Şêx Dodiyan e ku cih û rûniştina vê eşîrê di wî welatî de ye.

Nêzikî çiyayê Hezro û Farqînê li beramberî pira mala Dodê, bajarê Êlihê Batmanê, çawa tê zanînê ev dûrik di ber govenda hûrziya giranî re tê gotin, xortek dibêje û koma dîlanvanan bi keç û xortan re lê vedigerînin bê soz êdî rewah û hawayekî xweş û şêrîn û awazekî rewan dikeve guhê guhdar û sêrekeran çî ji hêla lênerînê û çî ji hêla guhdarkirinê de.

Dûrik eve :

Şêlî Şarê Şara min

Şêlî Şarê Şarê Şarê, şêlî Şarê Şara min
Şêlî Şarê Şarê Şarê, têtî yarê yara min
Şev û roj l' dîdarê min lê, şêlî Şarê Şara min
Şev û roj l' dîdarê min lê, têtî yarê yara min
Gulçîçeka buhara min lê, şêlî Şarê Şara min
Gulçîçeka buhara min lê, têtî yarê yara min
Tu heyva êvara min lê, şêlî Şarê Şara min
Tu heyva êvara min lê, têtî yarê yara min
Bejin bîst û çara min lê, şêlî Şarê Şara min
Bejin bîst û çara min lê, têtî yarê yara min
Tu ser pişk û para min lê, şêlî Şarê Şara min
Tu ser pişk û para min lê, têtî yarê yara min
Şara mine Surmeli ye, şêlî Şarê Şara min
Şara mine Surmeli ye, têtî yarê yara min
Ew leçeka dor morî ye, şêlî Şarê Şara min
Ew desmala dor morî ye, têtî yarê yara min
Çî nazik û çelebî ye, şêlî Şarê Şara min
Çî nazik û çelebî ye, têtî yarê yara min
Werdek û qaz û qumrî ye, şêlî Şarê Şara min
Werdek û qaz û qumrî ye, têtî yarê yara min
Dil cinet e tu horî ye, şêlî Şarê Şara min
Dil cinet e tu horî ye, têtî yarê yara min
Bi eslê xwe ve Şêxdodî ye, şêlî Şarê Şara min
Bi eslê xwe ve Şêxdodî ye, têtî yarê yara min
Te mirîdê xwe kuştiye, şêlî Şarê Şara min
Te mirîdê xwe kuştiye, têtî yarê yara min

Şêlî Şarê ezim ezim, şêlî Şarê Şara min
 Şêlî Şarê ezim ezim, têlî yarê yara min
 Wez leçeka dor gewez im, şêlî Şarê Şara min
 Wez desmala dor gewez im, têlî yarê yara min
 Rêwîngiyê li nav rez im, şêlî Şarê Şara min
 Rêwîngiyê li nav rez im, têlî yarê yara min
 Mîşterîyê sêva ez im, şêlî Şarê Şara min
 Bikirçiyê sêva ez im, têlî yarê yara min
 Tu gezo ye wez helez im, şêlî Şarê Şara min
 Tu hingiv î wez helez im, têlî yarê yara min
 Xwestîyê têlîyê ez im, şêlî Şarê Şara min

Xwestîyê Şêlîyê ez im, têlî yarê yara min
 Şêlî Şarê kî me kî me, şêlî Şarê Şara min
 Şêlî Şarê kî me kî me, têlî yarê yara min
 Wez leçeka dor morî me, şêlî Şarê Şara min
 Ez desmala dor morî me, têlî yarê yara min
 Tu ya sor î ez sipî me, şêlî Şarê Şara min
 Her Tu sor î ez sipî me, têlî yarê yara min
 Tu dost î wez dergîsî me, şêlî Şarê Şara min
 Tu yar î wez dergîsî me, têlî yarê yara min
 Tu rev î wez revoçî me, şêlî Şarê Şara min
 Tu rev î wez revoçî me, têlî yarê yara min

Şirovekirin

-Şêlî : Keça herî bedew.

-Têlî : Keça herî bedew û malmezin û kubar.

-Surmeli : Qezak e, dikeve welatê Serhedê wilayeta Qersê, bi şarên xwe navdar e, û dibêjin şar û zêrê Surmeli yanî qeseb û xerc û rêşî û bi wateya kilkirîyê tê.

-Çelebî : pir xweşik û nazik.

-Şêxdodî : eşîreke dikeve welatê Hezro û Farqînê, gundê wan yek ji Qurtoxlîyê ye, dibêjin ku ev eşîr oçaxzade ne.

-Leçek : xovik û kitana hivaztî û dor nimûş.

-Gewez : rengê di navbera sor û gewr û genimî de.

-Helez : giyayekî xweş û bi bîn e.

-Rev : hespa miînî

-Revoçî : siwarê hespa kihêl û siwarê çêra hespan.

-Hemawî : lefahîyê şalê bi rêşî ne, bi gelek rengan e, û hin jî dibêjin kejî yan bûşîya gulreng.

Wilo jî dibêjin :

Şêlî Şarê ez û tu ne, şêlî Şarê Şara min
 Şêlî Şarê ez û tu ne, têlî yarê yara min
 Ji me pêve kesek tune, şêlî Şarê Şara min
 Ji me pêve kesek tune, têlî yarê yara min
 Ger ez gul im tu sosin e, şêlî Şarê Şara min
 Ger ez gul im tu sosin e, têlî yarê yara min
 Çend sal herin tu ya min e, şêlî Şarê Şara min
 Çend sal herin tu ya min e, têlî yarê yara min
 Tu zerîya dest bazin e, şêlî Şarê Şara min
 Tu zerîya dest bazin e, têlî yarê yara min ■



Yabo,
Dibêjin: Tu ji min zirav û dirêjtir bû
destên te jî dilerizîn
û gotinên te yên şahîk
weke derewê evîndaran
zû dişemitîne dilan.
Ez nizamim wilo dibêjin.

Zarokek bûm, hîna fêr nebûbûm sola
xwe ya rastê ji ya çepê nas bikim, li
taxê û hevalên xwe, di kavilê Hiso de
em dicivîyan_ li paş mala me. Cigero
hevalê me, yê ji me tevan gemartir ji me
re digot: Diya min çûye Helebê, min jî
qîr dikir: Bavê min çûye Şamê, wê ji min
re bi xwe re şekiran bîne. Wilo ji min
re gotibûn û ez yê bavê xwe nedîtî li
hêviya wî dimam, li hêviya şekiran qena
hevalên xwe biqehêrînim. Ev dîmen
cêwiya bîreweriya min e, ji wê destpê
dike êş, li wê radiweste bal û destê xwe
dirêj dike ûçikên gotinên diya min dema
bixwaze tiştêkî din nas bike..

Li taxa me ya berê ha, mala me ya berê
ku li ser kolana giştî bû, ya ku fireh bûyî
û li ber xwe birî mala me, bîranînên min
jî, şûna lîstikên min û me sê kolanan bi
paş de avêtî, sê kolanan min dûrî hevalan
kirî û sê hezar kolan min dûrî min.

Gotinan wê demê rêya mêjî nas nedikirin, ne
jî min rêya malê di nav toz û heriya lîstikan de,
di nav zarokan de_ em zarokên ku mezinbûnê
em bijiqandin_ belav kirin bi rêyên ku kesek
nizane bi ku de diçin. Zarokên ku ji wan ez li
hêviya bavê xwe bûm ji Şamê vegere û Cigero
yê li hêviya diya xwe ya li Helebê.

Rojin din bûn ew, zû destpê dikirin, bi
hehecîkan re yên ku em şiyar dikirin lîstikên
me, civînên me yên girîng, axaftinên me yên
girîngtir û gera me li ser tîngan bo bafûn û lekan
bidinhev û bifiroşin bi dodirmayekê, herin çolê
bi navê bilîzin, gokê û bi hev pevbiçin û sixêfên
nû biaferînin, herin diziya şebeşan ji bîkaban,
lehaneyan ji baxçeyê Sofîkê Zeytê û avjeniyê
bi dizî di Evdiya, Ceqceq û golên Sêgirkan de
bikin, herin nêçîra civîkan, weşandina tiwan,
çavgirtinkê, xar, zîzok, qumara li ser ayis û
devikên gazûzan û bi qewsik û kerbanîk û
kevîran şerê zarokê ereban li Elaya_ taxa wan
ya ku nêzîkî me.

-Cigero diya te ji Helebê nehat ?

-Na, lê wê vegere.

-Wê bavê min jî ji min re ji Şamê bi xwe re
demançekê bîne ha, ez ê we tevan bikûjim !!
Wilo bavê min li bîra min bû, bavê min î ku
navê min li min kirî û çûyî dereke nediyar, raz
î ku ew ji Şamê vedigere min li gotinên wan
guhdarî dikir, bawer dikir û min nizanî bû diya
min her Pênşem êvarê, bi tevî şekiran bi ku
de diçe, her cejin sibehê. Min nizanî bû çima
diya min çav sor ji hêsiyan vedigere, şekiran
bi ku de belav dike, bitenê li hêviya bavê xwe
bûm ez_ mirovê dîlîzî ku dişibiya birayê min
Hemdîno bi dilbakiya xwe, bi mêraniya xwe,
mîrovê ku wê ji Şamê ji min re lîstikan bi xwe re
bîne, bi rê de ye û weke bavê hemî hevalê min
yên zarok bi hatina xwe re wê xwe bitewîne,
destên xwe vebike qena xwe bavêjim himbêza
wî û rahêje min û min bibe malê, ji diya min
re bibêje: Ev zarok vê germê li van kolanan çî
dike? Tûrikê xwe vebike, diyariyan li me belav
bike, gîrnijînan jî û diya min têbikeve navhev
de, nema dîzanî be çayê, qehwê, yan firavînê
ji wî re amede bike. Bavê min yê ku destê xwe
dirêj nekirî bîrîka xwe û pere nedane min
qena birevim dikanê, bavê min yê çî qasî rêya
wî dirêj bû !!

Em çî qasî li hêviya xwe hiştin !!

Ev tev û min hîna helbest nas nekiribû, ne jî xalê min reviya bû Elmaniya û pirtûkxaneya xwe li paş xwe hiştibû. Min gewrahiya girî nas nekiribû, gewrahiya xweşikbûn û afirandinê, çavdariyê, ba li ber min li porê keçikekê nexistbû hîna û riwê wê ji min neveşartibû qena ez bihejim weke ku bombeyk bi min de biteqe, ez zarok bûm looo, bavê min hebû, li Şamê, dîlzîz bû weke baranê carnar û carnar weke baranê har bû. Wilo birayê min yê mezin Serbest, ku ji me tevan bêhtir bavê min dîtî ji min re got dema di tirimbêlê de bûm ez, li rex wî û em diçûn bîranînên bavê min yê çixarekêş, bavê min î Zorba .

Mezinên taxê yên ku her tişt dizanî bûn, yên ku piştî çend hevokan ez ê yek bim ji wan bang li min dikirin, min jî çîroka bavê xwe ji wan re digot. Mezinên ku dikenyan û xemgîn dibûn bi hev re, destên xwe li ser porê min re dibirin û tiştêkî ku min fêm nedikir digotin û diçûn, Cigero li min dinihêrî û lîka wî diherikî, min jî xwe ji tozê didaweşand weke ku roj çû be ava û dema malê hatibe: Em ê bi şev hev bibînin, em ê bi çavgirtinê bilîzîn. Wilo min ji Cigero û zarokan re digot û hevokên ku min ew nedixwestin roj bi roj dihatin, ez fêr dibûm porê xwe şeh bikim, min solên xwe ji hev nas dikirin û ji lîstikên xwe dûr diketin em, ji hev û şebeşên me ew dizî bûn bi ser me de diketin, azad şîndihatin lehaneyên Sofîkê Zeytê û kesek nedima şerê zarokên ereban bike li Elaya, em mezin dibûn looo. Em mezin bûn û ne bavê min ji Şamê vegeriya, ne jî diya Cigero ji Helebê !! ■



عاشق داغستان

«شيئان في هذه الحياة يستحقان
الصراع، وطن حنون وامرأة رائعة!»



رسول حمزاتوف



مروان علي

إذا عثرت عليها . ورث حمزا توف عن أبيه موهبة شعرية خارقة استوعبت كل أساطير الجبال العملاقة وبساطتها وحكمتها ومكنته دراسة الأدب في موسكو من الإلمام بتراث الشعر العالمي وقوالبه فصب فيه خبرته الخاصة التي لا تتكرر ، دون أن يفقد بكاره تجربة بلاده ، ولا تاريخها ، ولا صراعها الذي دام ضد القياصرة ثلاثين عاما متصلة كانت الرصاصة خلالها أعز على القوقازي من جرعة الماء ورغيف الخبز. ورث رسول حمزاتوف موهبة الشعر عن أبيه و ورث معها موهبة استوعبت حكمة الجبال العملاقة وأساطيرها .

كتب رسول حمزاتوف خلال حياته أكثر من مائة كتاب بلغته القومية (الآفارية) في الشعر و النثر الفني والمقال و برز شاعرا داغستانيا قوميا منذ صدور ديوانه الأول «شعلة الحب و لهيب الكراهية» عام 1943 باللغة الآفارية قبل أن يتم العشرين من عمره ثم أصدر ديوانه الثاني «أصداء الحرب» عام 1945. ثم تتالت مجموعاته الشعرية و نظم حمزاتوف قصة شعرية ترجمت إلى العربية في ثمانينيات القرن الماضي عنوانها « داغستان بلدي » تعتبر من أهم مؤلفاته .

. يتميز شعر حمزاتوف المكرس لحياة داغستان المعاصرة بالصبغة القومية الساطعة و النزعة الغنائية .

لم يعشق حمزاتوف أرضاً كما عشق بلاده الصغيرة داغستان، تلك الأرض القوقازية الجبلية التي دخلها المسلمون العرب في القرن السابع الميلادي .

يوصي حمزا توف كل إنسان يعيش في هذا الكوكب أن يحمل أغنيته معه أينما ذهب : « إذ إن حملها لا يشكل عبئاً فأغنية الإنسان هي الوطن » كما يقول « ليس الكاتب من يستطيع توظيف التراث، بل الذي يصنعه » وبالتالي أصبحت جملة الشعرية جزءاً من التقاليد والتراث اليومي المتداول مثل الأمثال الشعبية والحكم، إضافة إلى جمالياتها الفنية التي استطاعت أن تملأ الفراغ الخانق بعد رحيل بسنن ومايكوفسكي وغوميلوف وبلوك وتسفتاييفا وأخمتوفا ومجموعة المستقبلين الروس.

ولد رسول حمزاتوف عام 1923 « في إحدى قرى داغستان البلاد الراحضة في أحضان جبال القوقاز . كان والده حمزة شاعرا نظم الشعر باللغة الآفارية كما نظم بالعربية . ويروي أن والده كان يكتب كل قصائد الغزل في النساء الأخريات باللغة العربية لكي لا تفهمها أمه

EYŞÊ ŞAN

[1938 - 1996]

Xatûna dengbêjiya kurdî Eyşê Şanê Yek ji navdartirîn dengbêjên kurd e, xwediyê dengê zîz û zelal e.

Li Ameda bakurê Kurdistanê di sala 1938an de ji dayik dibe, bi regeza xwe ji Erzerûmê ye, malbata wê ji ber şerê di navbera Rûs û Osmaniyan de ji devera xwe koçber dibin û li Amedê bi cih dibin, di wî şerî de hejmarek pir mezin ji kurdan hatin kuştin û yên mayî derbider bûn.

Hîn Eyşê Şanê zarok bû dema ku bavê wê Mihemed Osman di şerê cihanê yê duyemîn de nexweş dikeve û koça dawî dike.

Xwendina xwe ya seretayî li Amedê kuta dike, û zaroktiya xwe di nava xizani û perîşaniyê de derbas dike. Ji nav çar xweşk û birayekî ew xweşka mezin bûye, jib o debara jiyana xwe li mal hevîr dikirin û nan difirotin.

Ji zaroktî de dengê Eyşê Şanê xweş bû, li civata bavê wê dengbêj kom dibûn û stranên folklorî digotin, bavê wê jî gelek stranên stran digotin, Eyşê bi bavê xwe bandor dibe û dest bi goraniyê dike, destpêkê li civatên jinan distira, her wiha li Mûlidan Quran û sirûdên olî digotin.

Piştî ku ji dengê xwe bawer dibe dixwaze behreya xwe derxîne û stranên xwe belav bike, lê di civakeke older û ayînperest de şermeke mezin bû ku keç karê dengbêjiyê bike, lewre malbata Eyşê Şanê ev yek nepejirandin.

Di temenê 15 saliya xwe de Eyşanê kasêtekê bi dizî tomar dike û belav dike, dema ku



malbat vê yekê jê dibînin wê bi zor didin mêrekî bi jin û zarok û keçek jî jê re çêdibe. Eyşê Şanê vê rewşê napejirîne û li gel keça xwe Yasemînê direve Amedê.

Li Amedê û da ku xwe ji zimanê xelkê biparêze bi mêrekî re ku navê wî Çerkes e dizewice, lê merc û şertê Eyşê divê zewacê de ew bû ku hevserê li pêşiya dengbêjiya wê nebe asteng, ew jî vî mercî qebûl dike, lê mixabin ji ber adeta xwînê û tolhildanê Çerkes tê kuştin.

Piştî kuştina hevserê wê, Eyşê Şanê diçe Entabê, û li wir li navendeke firotina pilêtên basan kar dike, di heman demê de jî li ezgeha Entabê ya xwecehî de stranan dibêje.

Li Entabê gelek hunermend û dengbêjan nasdike û bi alavên mûzîkê yên nûjen re dest bi tomarkirina stranên xwe dike. Di destpêkê de bi zimanê tirkî distirê û nav û dengê wê belav dibe, lê ji ber ku bi kurdî jî distira ew ji alî ezgeha hekûmetê ve hate ji kar xistin.

Di sala 1961ê de, ji Entabê berê xwe dide Stembolê û li wir bi cih dibe, li Stembolê berhemê xwe yê yekemîn ku navê wî



(Ez Xezal im) tomar dike, di vî berhemî de 2 stranên kurdî hebûn di demekê de ku axaftina bi kurdî tawaneke mezin bû û siza wê digihîşt bi dar vekirinê, bi vî karî Eysê Şanê wêrekiyeke bêhempa dike. Berhemê wê di nav gel de deng vedide û bi regekî berfireh tê firotin, lê sextekar û cembaz keda Eysê Şanê dixun.

Di pişt re 2 berhemî din jî tomar dike, û navê û dengê wê bilindtir û berztir dibe, û konsirt û ahengên mezin li dar dixîne.

Ji ber ku bi kurdî stran digotin ew herdem rastî gef û tehdîdan dihat, di heman demê de jî soz didanê ku ewê bihêlin di radyo û televizyona TRT de bistirê û gelek pereyan jî bidinê beramberî ku dev ji stranên kurdî berde.

Lê hunermenda bejin bilind serê xwe ji wan re natewîne û bi wêrekî li hemberî wan radiweste, ev yek nîşan dide ku Eysê Şanê xwedî hesteke neteweyî û helwesteke bîrwer bûye.

Di ahengekê ji ahengên wê de û dema ku Eysê Şanê li ser dike bi kurdî distira, yek ji nijadperetên tirk êrîşê wê dike û wê bi kêrê birîndar dike.

Piştî vê bûyerê û di sala 1972an de,

hunermenda me ya bejinbilind derdikeve Almaniyayê, li wir û çend dewletên Ewropî ahengan li dar dixîne. Di wê demê de radyoya BBC hevpeyvîneke dirêj bi wê re çêdike.

Di sala 1975an de carek din vedigere Stembolê û li wir kasêtekê bi navê (Memo Gider Alamanya'ya) tomar dike ku ew ji navdartirîn berhemên wê ye, û bi regekî berfireh tê belavkirin û firotin.


Li ser vexwendina hin hunermendan Eysê xan diçe Îraqê, û bi hunermendên başûrê Kurdistanê yê navdar re mîna Mihemed Arif û Îsa Berwarî dikeve pêwendiyê, ji Mûsilê berê xwe dide Bexdayê û ji alî karmendên Ezgeha Kurdî bi germahî û qedirgiranî tê pêşwazî kirin. Li gel hunermendên mezin mîna Tehsîn Taha, Mihemed Arif, Resûl Kurdî, Gulbuhar û Îsa Berwarî li Bexda, Mûsil, Hewlêr û Dihokê aheng li dar xistin.

Piştî ku vegeriya Bakurê Kurdistanê û Turkiyê gelek zext û fişar ji alî desthilatdariya Tirk ve hate kirin, di encamê de di rewşeke derûnîyî dijwar de dijîya.

Di 1990 de, û dema ku qedexebûn ji ser zimanê kurdî tete rakirin Eysê Şanê 3 kasêtan derdixîne ew jî evin : (Werin werin pêşmerge- Diyarbekir- Newroz)

Di 18-12-1996an de Eysê Şanê li nexweşxaneyekê li Ezmîrê û di encamê nexweşiyê de koça dawî dike.

Hunermenda payebilind Eysê Şanê dikarîbû navê xwe di dîroka hunera kurdî de bi tîpên zêrîn binivîse, ji lewre dengê wê here û her dê zindî bimîne. ■



MÎHEMED RESÛL :

“ji bo ku me xwe ji hêzên ewlehîyê biparsta, me şano di axurên pez de pêşkêş dikirin.”



Hevpeyvîn: Imran Yûsiv

10

-kengî û çawa hûn derbasî cîhana şanogeriyê bûn ?

-Ji zaroktî ve, birayê min Mihemed Emîn di hunera şanoyê de dixebitî, komeke wan ya şano jî hebû ku navê wê koma navenda çandeyê bû, herdem wî ez bi xwe re dibirim prova, min li karê wan dinêrî û pir kêfxweş dibûm, hezkirina hunera şanoyê ji wê hingê ve kete dilê min. ez hîn xwendekarekî di refa pêncan de bûm dema ku min yekemîn şano bi xwe çêkir, ez çûm cem rêvebira dibistanê ku navê wê Êvêt Tano bû û min gotê : Ez dixwazim şanoyekê pêşkêş bikim. Ew li min matmayî ma û gote min bila. Mijara şanoya min li ser bertîlan û gendeliyê bû, navê wê (Derûnên nexweş) bû, min nivîsî û min derhênertîya wê kir tevî ku ez pir biçûk bûm, û ger ez li ser kursî rûdiniştim pêyên min nedigiştin erdê. Di qonaqa amadeyî de me grûpek

taybet çêkir û me karê şanogeriyê berdewam kir, dû re me xwe berda navendên çandeyî û wiha heya roja îroj min di karê şanogeriyê de berdewam kir.

-Gelo, we wek lîstikvan an wek derhêner dest bi karê şanogeriyê kir.

- Wekî girûpên şanogerî me dest pê kir, girûpa me jî ji kesên ku ji hunera şanoyê hez dikirin pêkdihat, bi rengekî komelî me şano çêdikirin çî ji alî lîstikvaniyê be, çî ji alî derhênertiyê be, lê wê gavê min di xwe re didît ku bandora min li girûpê wekî derhêner heye û min dikarîbû serkêşiya wan bikra, hevalkarên min jî ev yek di min re didîtin, bi vî awayî me gelek şano pêşkêşkirin.

-Li ser çî bingehan wa şanoyên xwe ava dikirin û diafirandin ?

-Li gorî behreya me, hezkirina me ji hunera şanoyê re, afirandin û hestbûna bi bedewîyê me kar dikir, lê tevî ku em ne kesin akadîmîk bûn şanoyên me bi şeweyekî berfireh dihatin şopandin, û di

pêşkêkirina wan de cemawerekî pir mezin hazir dibû, û bi wî karê xwe me dikarîbû bandoreke mezin li ser asta civaka Heseke bikira.

-Kengî we şano weke hunerekî xwedî hêman û regezên zanistî naskir ?

-Di qonaxa ku min wekî hezker di şanoyê de karkir, min gelek şano pêşkêş kirin û xebateke minî baş çêbibû. Dema çûm leşkerîya neçar ez li bajarê Lazeqiyê ketim, li wir min derhênerek naskir ku derhênertî li dewleta Tşîkoslovakya xwendib navê wî Hesen Selîm bû, wekî lîstikvan min bi wî re karkir, wî jî pir ji min hezkir û ez fêrî regez û awayên şanogerî û derhênertîyê kirim, min sudeyek pir mezin ji vî mirovê dilpak girt, herdem wî hewil dida ku hemû zanyariyên xwe û zanîna xwe ya şanogerî bigihîne min, ez jî bi hezkirin jê fêr dibûm, 4 sal û nîv ez li gel wî mam, ji bo min wek xwendina peymangeha bilind ya şanogerî bû, dema ku leşgeriya min bi dawî bû, wî gelek pirtûk û noteyên fêrkirinê yên hunera şanoyê dane min ticarî vê qencyê jê re ji bîr nakim, min jî ew zanîn û pirtûk bi xwe re anîn bajarê xwe. Qonaxeke nû di ware şanogerîyê de ji bo min dest pê kir, vêca li gorî regezên zanistî min karê şanogerîyê berdewam kir . di qada şanogerîyê de navekî min çêbû, û ez di 5 mirîcanan de li ser asta Sûriyê beşdar bûm û min gelek xelat wergirtin ji nav wan xelata baştirîn şano û baştirîn derhêner .

Dawî şano ku min di mihricana şanoya Sûrî de pêşkêşkir şanoya Birrek bû.

-Di gellek şanoyên we tu wekî lîstikvan hem jî wekî derhêner beşdar dibû, te çawa dikarîbû herdu karan bi hev re bikî ?

-Wek ku ez ji derhênertîyê hez dikim her wiha ez ji lîstikvaniyê jî hez dikim, di wê demê de laşê min hîn sivik bû

û min dikarîbû li kêleka derhênertîyê bilîzim jî. Dema ku ez bi lîstikvanên xwe re dadiketim lîstikê, baweriya wan zêdetir dibû, lê aliyekî wê yî nerînê jî hebû ku di çend kêlikên destpêka şanoyê de bi çavê derhêner min çavdêrî li rola lîstikvanan dikir û min ji bîr dikir ku ez jî lîstikvanek ji wan im, sedemê vê yekê jî ew bû ku yê derhêner herdem xwe dibîne perpîrsê pêşî p yê dawî di ber asta şanoya xwe de. Lê Aniha tenê wekî derhêner kar dikim.

-Hûn mijarên şanoyên xwe li ser çi pîvan û çi bingehan dibijêrin ?

-Di serî de divê mijar nû be û kesekî berê ew destnîşan nekirbe, ez bêtir meylê mijarên siyasî me, tevî ku min gelek serêşî ji dû wan dîtîye, ez hez ji şanoya pabend dikim, şanoyên min jî tevde yên pabend in, divê gotara wan xurt û bi bandor be, ez mijarên wekî (azadî-şoreş-demoqrati-guhertin-rastî...hwd) di şanoyên xwe de pêşkêş dikim.

Lewre hêzên ewlehî gelek pîrsgirêk û astengî ji min re çêdikin, û piştî her şanoyekê ez ji alî wan ve dihatim kişandin û lêpîrsîn bi min re dikirin.

-Emê derbasî qonaxa karê we di şanoya kurdî de, kengî û çawa we dest pê kir.

-Dema ku min di şanoya erebî de kar dikir gelek rexne li min dihatin kirin tevî ku di wê demê de hîn şanoya kurdî tinebû û imkanên wê pir lawaz bûn.

Divê em ji bîr nekin ku me sudeyek pir mezin ji karê xwe yê di şanoya erebî de wergirt û ew ezmûneke pir girîng bû ji bo me.

Vê dawîyê behane naman, vêca me xwest wê ezmûna xwe têxin xizmeta şanoya kurdî.

Destpêkê Ez, Xidir Mihemed û Salih Kiwetî, me grûpek şanogerî avakir û gelek şano di mal û hewşan de her wiha li çolê jî me pêşkêş dikirin.

Heman girûpê şano bi erebî û bi kurdî jî pêşkêş dikir, cudahî tenê ziman bû.

Dû re me alîkariya komên folklorî kir wek koma Helebçe û koma Tolhildan û min bi dehê şanoyan ji wan re derhênan kir. Wê çaxê me biryar da ku ji bo pêşxistina şanoya kurdî emê bi hemû kom û aliyan re alîkar bin û rola xwe wek hunermend û şanoger li gorî ku ji me tê xwestin em bilîzin.

Armanca me ew bû ku em bikaribin bingeke ji şanoya kurdî re li Rojavayê Kurdistanê deynin û em wê ji wî qalibê newrozan derxînin, ji bo vê yekê jî me gelek zehmetî kişandin ji ber ku hemû karê me bi dizî bû, ji bo ku em xwe ji çavên hêzên ewlehiyê biparêzin me şano di axurên pez de pêşkêş dikirin.

-Hûn rewşa şanoya kurdî li Rojavayê Kurdistanê bi taybetî piştî damezirandina rêveberiya xweser çawa dibînin ?

-Rêveberiya xweser destê xwe danî ser gelek navendên çandeyî, li her bajarekî navendek heye, û her navendek koma wê ya şano heye, vê yekê alîkarî kir ku tevgera şanogerî di rewşa berdewamiyê de be, ev cara yekemîne ku karê şanoya

kurdî derdikeve ber ronîyê piştî ku demeke dirêj di nava tarîyê de mabû, êdî dezgehên me yên şanogerî avabûn û piştî ku me şanoyên xwe di odeyên teng de pêşkêş dikirin îro roj em li ser textê şanogehan karê xwe dikin. Di 2015an de mihîrîcana şanoyê jî hate li dar xistin û heya îro roj ev 4 mihîrîcan li dar dikevin.

Di van çend salan de şanoya kurdî hin bi hin xwe dide xuyanîn û avakirin lê heya niha ew negihiştiye wê asta bilind ya ku em dixwazin, hîn gelek kêmanî û lawazî hene. Lê bi giştî xebata ku hatiye kirin di warê şanogeriya kurdî de heya îro roj cihê şanazî û kêfxweşiyê ye.

-Bi dîtina we, jib o pêşxistina şanoya kurdî çi gerek e ?

-Berî her tiştî piştgiriya aborî gerek e, bi taybetî ji bo şanogeran da ku bikaribin berdewam kar bikin, her wiha pêdiviya me bi deqên bi kurdî heye ku girêdayî pirsgerêk û nexweşyên civaka me bin, di heman demê de jî perwerdekirina şanogeran gerek e. ■



تتمة المقال: عاشق داغستان

العربي يعرف من نتاج الشاعر الروسي الشهير رسول حمزا توف سوى كتابه «داغستان بلدي» الذي ذاع صيته في العالم العربي وكاد يصبح العنوان الوحيد الملتصق باسم الشاعر، والذي تمت ترجمته الى لغات عالمية عدة. واللافت في الكتاب المذكور أنه كتاب عابر للأجناس الأدبية التقليدية بحيث يضم بين دفتيه الرواية والشعر والسيرة الذاتية والخرافة والقصص الشعبي، الأمر الذي وفر له القدرة على الانتشار والرواج ومحاكاة أذواق القراء على اختلاف مشاربهم. لكن ما أسهم في توفير الشعبية الواسعة لحمزاتوف هو أسلوبه الرشيق وعبارته الديناميكية وتمكنه البالغ من السرد بلغة تجمع بين البساطة والعمق، بين روح المشافهة الجمعية وبين الحفر بعيداً في تراب الأسطورة والمكان الأصلي.

سأحاول أن اختتم الكتابة ببعض من أقواله :

- حين تُسأل من أنت، يمكنك أن تقدم وثائقك، هويتك التي توجد فيها كل المعطيات الأساسية، وإذا ما سُئِلَ شعب من يكون، فالشعب يشير إلى العالم، الكاتب، الفنان، المؤلف الموسيقي، رجل السياسة، القائد الذي أنجبه ويعد كلاً منهم وثيقة تدل عليه
- شيطان في هذه الحياة يستحقان الصراع، وطن حنون وامرأة رائعة !
- الشعب بدون كتاب كإنسان بدون مرآة لا يستطيع أن يرى
- أطلع إلى وطني من شباك قفصي ! ■

في عام 1959 منح حمزاتوف لقب شاعر الشعب في داغستان . كما منح جائزة (شاعر القرن العشرين) عندما احتفل العالم بعيد ميلاده الستين بروما احتفاءً بإبداعاته الشعرية خاصة « ناقوس هيروشيما » و « صلاة » .

و تكمن أهمية حمزاتوف بصفة خاصة في قدرته الفائقة على التعبير عن تراث و حكمة شعبه لأن الشاعر عنده كما قال في كتابه (داغستان بلدي) هو « رسول الشعب و حامل كلمته المقدسة و أهميته تكمن في أن يصوغ الحكمة التي عجنها شعبه » .

ارتقى حمزا توف ليقف في صف واحد مع كبار الشعراء في العالم و مع ذلك ظل محافظاً على نكهته القومية المطعمة بروح إنسانية و فنية عالية و كانت تلك هي السمة الأهم من سمات شاعريته فقد كانت موهبته موهبة إبداعية كبيرة تركت بصماتها على التجربة الشعرية في العالم - فقد كان الإنسان هو الشخصية الأبرز في قصائده بما يحيا به ذلك الإنسان من هموم دنيوية وجودية ..فهو يغوص إلى أعماق الإنسان الداغستاني ليتغنى به ومعه بنغمات مطعمة بالفلسفة و الإحساس بالكون

عمل نائباً بمجلس السوفيات الأعلى ورئيساً لاتحاد كتاب داغستان، وحصل على لقب شاعر الشعب عام 1958 ثم على جائزة لينين وجائزة لوتس الأفروآسيوية وجائزة نهرو. ورغم ذلك فهو لا يهتم كثيراً بالجوائز ويرى أنها ليست القيمة الحقيقية للكاتب الحقيقي خاصة إذا كان شاعراً.

رغم تنوع كتاباته الأدبية والشعرية لا يكاد القارئ



GELO !

SEDEMÊN ŞEWATA

ZEVIYAN ÇI NE ?

Efsan Kurdî

Pîştî zivistanek bi xêr û bêr û barîna baraneke pir zêde, cotkarên Rojava bi dilekî germ hêviyên xwe bi çandinyê girêdan ku ev sal wê mûsim gelek baş be, lê mixabin hêviyên wan bi cî nehatin.

Em dizanin ku heft beleyên zad hene ya sivik agir e, lê îsal li Rojavayê Kurdistanê beleya herî giran agir bû.

Bi hezarên doniman ji zeviyên ceh û genim şewitîn û bûn para agirekî bêbext.

Raste hersal di dema çinîna zadan de carcaran agir bi hinek zadan ve diket, lê sedemê êgir diyar bû. an ji deraseyê bû an jî ji ber qûnçikek çixareyê bû.

Agirê îsal ne wek yê ti salê ye, cotkar bi xwe lê matmayî mane û dibêjin ku destin qirêj li dû van şewtên bêhempa hene, bi taybetî piştî ku asayîşa Rojava ragihand ku wan hin kes girtine û destên wan kesan di şewata zadan de heye.

Desteya Çandiniyê ya biser rêvaberîya xweser jî bangê belavkir û ji hemû sazî û dezgehên rêveberiyê yên têkildar xwest ku bi cotkaran re alîkar bin, her wiha ji welatiyan jî xwest ku bi hev re alîkar bin. Di heman demê de jî hemû turimpêlên agirkujîyê yên heyî di amadebaşiyê de bûn û li her gunekî jî bang li xwediyên stêrên avê û xwediyê terektozan hate kirin da ku ew jî beşdariyê di vemirandina agiran de bikin.

Tevî van tedbîran jî, agir ziyaneke mezin gihand mûsimê îsal û xwediyê zeviyên.

Di der barê vê karesetê û sedemên wê de kovara

Welat nêrînên hin xelkên Rojava stand. Sîrwan Omer welatiyek ji Amûdê ye dibêje:

"Ti salan wek vê şewatê rûnedaye, bêguman destin li dû hene, em dixwazin lêkolî û lêpîrsîn di der barê van agiran de çêbibe û kesên tawanbar bêne destnîşankirin û siza kirin."

Sîrwan diyarkir ku ji bo parastina ziviyên ji agir û şewitandinê divê tedbîrin lezgin ji alî rêveberîya xweser ve bêne standin, û divê hejmara tirimpêlên agirkujîyê zêde bikin, her wiha ji xelkê jî tê xwestin ku bi hev re alîkar bin û çavdêriya zeviyên xwe bikin heta ku bêne çinîn.

Welatîkî din bi navê Hisên Elî rexne li cotkara kir û got:

"Raste ku ti caran me agirên bi vî awayî nedîtine û dibe ku destin qirêj li dû wan hebin, lê ez cotkaran jî sûcdar dibînim di ber vê şewatê de ji ber wan hemû erdê xwe çandibûn û hustek jî jê nehiştibûn, eger di navbera zevî û zevî de çend mitir erda neçandî heba agir ji zeviyekî nedigihîşt zevîyê kêlekê, kontrolkirina agir jî wê hesantir ba û wê ziyar jî kêmtir bana. dibe jî ku her cotkarek li derdora zevîyê xwe daran biçîne da ku wî ji zevîyên din veqetîne. Bi hêvî me ku sala bê cotkar vê yekê di ber çavan re bigrin û nekevin heman şaşîtiyê."

Weltiyê bi navê Omar Hesen dibêje :

"Şewta zadan ziyaneke mezin gihand cotkaran, divê rêveberîya xweser alîkariya wan bike ji ber ku debara jiyana wan li ser wan zadan bû û ew zad hatin şewitandin."

Bêguman şewata zadan kareseteke mezin bû, hêviya me ewe ku di salên pêş de dûbare nebe. ■



FERHENGOK

ciyawaz	ممیز - مختلف
efsûn	سحر
efsûndar	ساحر
cendek	جسد
term	جثة
fêlbaz	مشعوذ
Nepen-nehên	مجهول
perestgeh	معبد
xwedawend	اله
lava	دعاء
buhîşt	جنة
dojeh	جهنم
perî	حورية
bawermend	مؤمن
gawir	غير مؤمن - كافر
oldar	متدين
firişte	ملاك
xêrnexwaz	شرير
peyamber	رسول
peyrew	مريد



BINDARÛK .. ZEVIYÊ PIRTÛKÊN KURDÎ

kovara Welat



Bi salan pirtûkên kurdî li Sûriyê qedexê bûn, û eger pirtûkeke kurdî bi kesekê-î re hatiba girtin ew ji alî hêzên ewlehîyê yê Sûrî ve dihate girtin û êşgencekirin û rastî lêpîrsînê dihat, wek ku tawaneke mezin kiriye.

Piştî damezirandina rêveberiya xweser li Rojavayê Kurdistanê, pirtûka kurdî ji bin barê qedexeyê derket, vêca nivîskarên kurd ên ku li hundirê welêt dijîn dest bi çapkirin û belavkirina pirtûkên xwe kirin, hejmarek ji pirtûkan pyda bû, lê ev hejmar têra pêwistî û daxwazên xwîneran nedikir.

Bi geşbûna zimanê kurdî re û bi pîrbûna xwînerên wî re, pêdivî bi pirtûkxaneyan hebû ku karibin pirtûkan ji xwîner re peyda bikin.

Di vê biwarê de Bindarûk xwediya destpêşxeriyê bûye û yek ji pirtûkxaneyên pêşeng bûye ku li bajarê Qamişlo hate vekirin.

Di der barê vê projeyê de, nivîskar Ebas Mûsa ku ew yek ji damezirînerên Bindarûk e ji kovara Welat re axivî û got : Ez û hevalê min Ebdo Şêxo ji destpêka vê salê ve, me ev proje damezirand.

7-8 heyvan berê me amadekarî û haziriyên wê kiribûn. Sedemê dirêjbûna dema amadekariyê jî ew bû ku gelek pirtûk li hundirê welêt peyda nedibûm, ji lew re em neçarbûn ku pirtûkan ji bakur û başûrê Kurdistanê her wiha ji Libnan, Bexda û Şamê jî bixwazin, di vê yekê de me gelek zehmetî kişandin.

Di der barê armancên wan ji dû vekirina vê pirtûkxaneyê de Mûsa ragihand ku wan xwest cihekî taybet bi xwendina pirtûkan peyda bikin da ku xwîner bikaribe lê

rûne û bixwîne, her wiha bikaribe pirtûkan jê bi dest bixîne û bikire jî.

Di nav refikên pirtûkxaneyê Bindarûk de, derdora 3000 pirtûkên cûbicûr hene, di vî derbarê de Ebas dibêje ku pirtûkên Bindarûk bi zimanên; Kurdî (kurmançî û soranî), Erebî, Ingilîzî û hin bi zimanê Tirkî jî hene, lê ew bêtir giraniyê didin pirtûkên bi zimanê Kurdî, di heman demê de ew dixwazin çanda deverê ber bi pêş de bibin.

Bindarûk dikarîbû bidestxistina pirtûkan ji bo xwîneran hêsan bike, lê nîrxên hemû pirtûkan ne wekî hev û dû ne, di vê derbarê de nivîskar Ebdo Şêxo ku ew jî yek ji damezirînerên Bindarûk e ji kovara Welat re axivî û got : Mesrefa vê projeyê hinekî giran e, em piraniya pirtûkan ji derve tînin û kirêya anîna wan didin, her wiha kirêya cih jî buha ye, em hewil didin ku nîrxê diravî yê pirtûkê di asta herî kêr de be, lê anîna pirtûkan ji derveyî welêt bi dolar e û kirêya rê jî li wan diçe ev dihêle ku nîrxê wan buha be, ev yek jî bargiranîyekê li ser xwîneran diafirîne, lêbelê nîrxê pirtûkên ku em ji hundirê Sûriyê û ji Rojavayê Kurdistanê bi dest dixînin arzantir e.

Şêxo ragihand ku asta xwendina pirtûkê û bi taybetî ya pirtûkên bi zimanê kurdî li Rojavayê Kurdistanê baş e, nemaze piştî ku zimanê kurdî bûye zimanê xwendinê li dibistanan û zanîngehan êdî xwînerên bi kurdî pir bûne, ew jî hewil didin ku pêdiviyên wan ji pirtûkan peyda bikin.

Ebdo dibêje ku armanca wan pêşxistin û geşkirina rewşa çandeyî ye. lewra wan gelek pirtûkên bi zaravê soranî anîne da ku xwînerên rojavayê Kurdistanê wêjeya kurdî ya bi zaravê soranî jî nas bikin, her wiha ew herdem hewil didin ku hemû pirtûkên bi nîrx û yê navdar di nav refikên pirtûkxaneyê xwe de bicivînin da ku wan nas bike û wan bixwîne.

Hêjayî gotinê ye ku di salên dawî de li rojavayê Kurdistanê xwendina bi zimanê kurdî ber bi zêdebûnê ve diçe, lê pêdivî bi tevgereke çapkirinê, weşanê û wergerê ve heye da ku pêdiviyên xwîneran ji pirtûkan cîbicî û têr bike. ■



معهد «مزوبوتاميا».. حين تغلب الموسيقى لخدمة الحرب

تقرير مجلة ولات

في مدينة الحسكة و يلقي إقبالا متزايدا من قبل المتدربين. حول هذا المعهد و سير التعليم فيه تحدث مدير المعهد الأستاذ فرج درويش لمجلة ولات قائلا :

«كان افتتاح معهد ميزوبوتاميا لتعليم الموسيقى بمبادرة من هيئة الثقافة التابعة للإدارة الذاتية و تم طرح المشروع علي فوافقت, من ضمن أهداف المشروع -إضافة إلى تعليم الموسيقى- تشكيل فرقة اوركسترا كبيرة شرقية و غربية و أيضا نشر و ترويج آلات موسيقية جديدة في المنطقة (قانون - ناي - تشيلو - فيولا - انترباس-كلارينيت- فلوت) إضافة إلى الآلات الرائجة في المنطقة و إحياء بعض الآلات التراثية كالكمنجة مثلا.

تم افتتاح المعهد في ٢٠١٩-٢-١٦ في حي الصالحية حيث يتم استقبال الطلاب من عمر ٤ سنوات حتى عمر ٢٠ سنة ,لدينا حاليا حوالي ٥٠ طالبا من مختلف الأعمار و من الجنسين,كما يقوم المعهد بتقديم الآلات الموسيقية المتوفرة لديه للمتعلمين, في الوقت الحالي أقوم أنا بتدريس الطلاب لكن قريبا سنزيد عدد المدرسين في المعهد كما سنقوم بتخصيص سيارة لنقل الطلاب خاصة الذين يسكنون في الأحياء البعيدة .»

وسط معمعة المقتلة السورية ثمة حيوية ثقافية و فنية مميزة تقارع بشاعة الحرب و تضيء على الحياة بريقا من الجمال لتحافظ على الحس الإنساني الأصيل المتجسد في جماليات الفن و روحانياته.

إنها إرادة الحياة التي أبنت أن تستسلم لكل القبح الذي أنتجته الحرب فخلقت حالة إبداعية إنسانية راقية تبقي جذوة الأمل متقدة في أبهى صورها.

في الحروب عادة لا تسمع سوى أصوات المدافع و أزيز الرصاص, عويل الثكالي اللواتي افترست الحرب بلا رحمة فلذات أكبادهن و أنين اليتامى الذين غادرهم آبائهم على عجل دون قبرة وداع و آهات المشردين الذين هاموا على وجوههم هربا من قصف طائرات احترفت تدمير البيوت بلا هوادة.

حين تعزف الحرب سيمفونيتها القاتلة تتحول الأمكنة إلى مقابر متشحة بحزن عميق و تسود كآبة ثقيلة.

من هنا أيضا مرت الحرب و لم تغادر بعد , فعلت الحرب ما تشاء فقتلت و دمرت و شردت لكنها لم تستطع أن توقف سيمفونية الحياة .

في المناطق الكردية (روج آفا) الأمر مختلف تماما إنها حالة فريدة من نوعها.

هنا يقبل الناس و خاصة الأطفال على تعلم الفنون المختلفة ليعزفوا لحن الحياة بقلوبهم المفعمة بالحب و الإنسانية, فخلال سنوات الحرب افتتحت العديد من المعاهد و المراكز الفنية و الموسيقية التي يؤمها العشرات من الطلبة و المتدربين.

معهد ميزوبوتاميا هو واحد من المعاهد الموسيقية و الذي افتتحته هيئة الثقافة التابعة للإدارة الذاتية مؤخرا

17



SIMBILÊN ROJAVA



Kerem Yûsiv

18

Li ser van rêyên dirêj,
tiştê ku dişewite, ne simbil e,
ew zarokên me ne
ên ku di nav zevîyan de em wan xwedî
dikin.
Aniha li ber çavên me bêdeng dişewitin
di cihê xwe de
Bi carekê re radizin.. dimirin.

Di zivistanê de çavên me li ewran bûn
me berbejin bi simbilan ve vedikir
Da ku ew ewir di ser zeviyên me re derbas
bibin
Da ku tîna simbilên me bişkînin
û em û simbil bi hev re şîn bibin.


Çaya me,
ava me
nanê me
por û rûyê me
kinc û mûyê sînga me
Tijî bêhna şewata simbilan bûne

Destmala min, di dest min de ye
çavê xwe li hawêrdora xwe
digerînim
carinan bi alî bakur ve bazdidim
carinan bi alî rondikan ve
bi destmalek şilkirî şerê agirekî
kîndar dikim
da ku çend simbilan
ji komkujîyê rizgar bikim.
Diwestim
Xwêdana şor bi ser pêlên agir de
dibare
Şor û tal tevlî hev dibin
Û ji çavên min rondik weke barana
bêhêviyê dibarin
Çi hov e...ev agir
Xwêdan û hêsrên min dadîqurtîne
Çi bêbext e.. ev agir
Min û simbilên min
ji hev û du vedîqetîne
Û dilê min, simbil bi simbil
dişewitîne.

ji xeftanê Tirbespiyê
bêhna şewata zeytûnên Efrînê
dikim
li vir simbil li ser zeytûnan digrîn
û çav nema dizanin
li ser çî bigrîn û bigrîn
Leşkerê Tirk
agir bi av û zeytûnên me dixê
Leşkerê Şamê
Agir bi pêçekên zarokên me dixê

Min rahişt komek simbilên şewitî
 Û ber bi zewiyê xwe ve çûm
 li şûna her simbileke şewitî
 Min simbilek ji dilê xwe danî
 Û min di guhê her simbilekê de got:
 Sala bê ez û zarokên we
 Emê gelekî dirêj bibin
 Emê bigihêjin rokê
 Emê bibin agir
 Da ku ti agir me neşewitîne. ■

Tablo ya hunermend: Hasan malla



معهد "مزوبوتاميا" ..

حين تغلب الموسيقى لغة الحرب



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya



العدد (٦٤) ٢٠١٩/٧/١ م